Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1213 | 16-Cotmeh-2024 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
rojnameyaronahi
@ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com
Rojnameya Ronahî
+963 984 370 218

# Wênesazek bi tabloyên xwezayî Kurdistanê dide naskirin



Wênesaz Dilşad Kiwêstanî hewil dide bi firçeya xwe bedewiya Kurdistanê xêz bike û tabloya xwe spî bi kulîlkên sor û kesk yên deşt û berfa çiyayan tijî bike, her wiha bi rêya wêne û hunera xwe, xwezaya bedew ya Kurdistanê bi cîhanê bide naskirin û dibêje “Kurdistan di ruhê min de, ez jî di ruhê wê de dijîm.”

Navê rast yê hunermendê wênesaz Dilşad Mihemed Emîn Mecîd Bege lê weke Dilşad Kiwêstanî tê naskirin. Di 13’yê Tebaxa 1957’ê de li taxa Îmam Qasim ya bajarê Kerkûkê jidayik bûye. Hîn di destpêka temenê xwe yê zaroktiyê de mereqa wî ya wêje û hunerê hebû. Di temenê 16 saliyê de dest bi çêkirina wêneyan kir. Her wisa gelek stran tomar kirine û di gelek fîlman de wek aktor rol leyîstiye. Her wisa li 20 welatên cîhanê pêşangehên xwe yên taybet vekirine û niha jî li bajarê Silêmaniyê dijî.

Wênesaz Dilşad Kiwêstanî li sala 1961’ê hîn di çar saliya xwe de ji ber xirabkirina taxa wan û ji bi hinceta ku Kurde derxistina bavê wî ji Şîrketa Petrolê ya Kerkûkê, bi neçarî barkirin bajarê Silêmaniyê. Xwendina seretayî li Dibistana Goyje temam kiriye û xwendina navîn li Navenda Rewşenbîriyê temam kir û li sala 1985’ê dest bi karê hunerê kir. Kiwêstanî ji hezkirin û eşqa xwe ya ji Kurdistanê re wiha behsa peywendiya xwe û Kurdistanê dike; “Ez xelkê her quncikek yê Kurdistanê me. Ji ber ku ev ruhê di hindirê min de pêş ketiye. Ez xwe weke xelkê ji Kurdistana mezin dihesibînim û dizanim.”

Dilşad Kiwêstanî li sala 1996’ê li Yewnanistanê tevlî pêşangehekê hevpar bû û li sala 2005’ê wek Serokê Rêkxistina Çandî ya Fransa û Efrîqayê hat diyarkirin. Li sala 2017’yê li bajarê Silêmaniyê pêşangehek bi navê ‘Seferek di nav ruh de’ vekir.

Galeriyeke taybet ya wênesaz Kiwestanî li Fransayê heye ku zêdetirî 70 pêşangehên taybet lidar xistiye û tevlî zêdeyî 30 pêşangehên hevpar bûye. Berhemên xwe li zêdeyî 20 welatan di pêşangehan de nîşan daye. Her wisa weke aktorekê tevlî çendîn fîlmên Kurdî û Fransî bûye û hêjayî gelek xelatên hunerî hatiye dîtin.

Kiwêstanî dibêje “Ji bo dîtina tabloyên min, bîner li Kurdistanê ne bi vî rengî fêrnebûne ku reng wiha bên têkilkirin. Di encamê de ji bo nîşandana tabloyeke ku nêzî rastiyê ye, dema ku hûrgiliyan jê derdixim û bi awayê xwe jinûve dîzayn dikim, ji bo dema ku ez tabloyek ji xweza û kaniyên xweş yên Kurdistanê xêz dikim, divê bîner bala xwe bide tabloyê. Ji bedewî û peyama tabloyên min fêm bikin.”

Kiwêstanî di destpêkê de li ser teşe û anatomiya mirovan bi mecazî xebitî. Lê belê, paşê, ji ber ku wî bêhtir çanda welatên Ewropayê, mûzexane û galerî nas kirin, li ser dîtina şêwaza xwe ya wênesaziyê xebitî. Lê belê, tabloyên wî di destpêkê de abstrakt (xeyalî) bûn. Her çi qas ev şêwaz tê wateya rakirina form, şêwe û jinûve avakirina wan. Herwiha di bin bandora wênesaz Claude Monet, William Turner û Zawki de maye û kariye vê şêweya hunerê vegerîne Kurdistanê û li ser bixebite û pêş bixe.”

Paşê Kiwêstanî dev ji şêwaza abstrakt berda û li şêwaz û rengê xwe geriya. Ew dibîne ku ew pir nêzîkê rengê pirteqalî ye. Lê çima rengê pirteqalî? Ji ber ku di dîtina Kiwêstanî, rengê pirteqalî ango roj ku ji zarokatiya xwe de di bin tîrêjên rojê de mezin bûye û pê hesiya ku pêwîstiya wî bi çêkirina tabloyan li ser welatê xwe Kurdistanê heye. Ji bo piştrastkirina vê yekê, wek ku Kiwêstanî bi xwe dibêje “Dema ez pêşmergebûm li gundê Mamenda yê ser bi bajarokê Helşoweyê, min bi dehan tablo xêz kirin, ku ax û xwezaya Mamende vedibêjin.” Ji bo wênesaz Kiwêstanî hebûna welat û Kurdistanê tê wateya hebûna rûmet û hezkirinê. Dema vedigere welat wekî ku ew bi xwe li ser vê yekê dibêje: “Ezê têr axa Kurdistanê maç bikim. Ji ber ku Kurdistan di ruhê min de dijî û ez jî di ruhê wê de dijîm. Hûn nizanin nebûna netew û netewê çiqas zehmete.”

Di dawiyê de hunermendê navdarê wênesaz Dilşad Kiwêstanî derbarê bandora welatên dagirker li ser ax û welat wiha dibêje: “Mixabin ji ber ku dagirkeran em kirine çar parçe, pêwîstiya me hemûyan bi têgihiştineke mezin di nava hev de heye ku em bibin yek. Ji bo vê jî divê em guh bidin evîneke wisa ku em bi ax û welatê xwe ve girêdayî bin.” **ROJ NEWS**

# Bi berhemên destan karê xweser ava kir

**Ibtîhal Mehmûd a 34 salî ji gundê Til Şiîr ê girêdayê navçeya Tirbespiyê yê bajarê Qamişlo Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê ye. Bi berhemên destên xwe û berhemên ku bi morîkan çêdike ji xwe re karê xweser ava kiriye.**



Jinên Kurd bi hunera karên destan kevneşopiyên xwe diparêzin. Ibtîhal Mehmûd jî jineke Kurd e bi temenê xwe 34 salî ye ji gundê Til Şiîr ê girêdayê navçeya Tirbespiyê ya bajarê Qamişlo Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê ye. Ev demek e bi hunera destan re mijûl dibe. Ibtîhal Temo têkildarî karê xwe ji ajansa me re axivî.

**‘Dema ku berhemên destan çêdikim pir kêfxweş dibim’**

Ibtîhal Mehmûd behsa destpêka karê xwe kir û got: “Min di dibistana hunerên bedew de dixwend. Bi riya xwendinê, ez fêrî berhemên destan bûm. Dema ku berhemekî bi dest çêdikim, pir kêfxweş dibin. Berhemên bi destan tên çêkirin, rojên zarokatiya me tînin bîra me. Dayika me çawa ji me re di cejna Newrozê de tiştên xemlandinê amade dikir. Ez jî li ser wê şopê dimeşim. Dema ku dibe cejna Newrozê yan 8’ê Adarê tiştên xemilandina jinan amade dikim. Weke êleg kum û kofiyan û hwd. Carna gelek kes daxwaza bazin, zincîr û zincîrên zarokan dikin. Piraniya berhemên xwe li ser malpêra xwe ya medyaya dîjîtal difroşim. Milet pir ji berhemên destan hez dike ji ber ku ev kevneşopiya me Kurdan e.”

Ibtîhal Mehmûd behsa amûrên ku pê kar dike û di destpêkê de di çi zehmetiyan re derbas bûye kir û wiha berdewam kir: “Zehmetiyên ku min dikişand ew bûn ku amûrên min pê kar dikir zû bi zû peyde nedibûn. Ya duyem amûr pir beha dibin, ji ber vê yekê zehmetî dihatin kişandin lê bi demê re, em wan zehmetiyan derbas dikin. Amûrên ku ez pê kar dikim derzî, tayê lastîk, tayê normal, sinare û tayê rîs e. Bi tayê rîs kum, lefahî, yelek, çente û gelek tiştan çêdikim. Ez dixwazim di pêşerojê de pêşangeheke hunerî ya berhemên destan vekim da ku em hemû berhemên xwe tê de derxin bazarê û kevneşopiyên xwe biparêzin.”

**‘Min du pêşangeh li navçeya Tirbespiyê vekirin’**

Ibtîhal Mehmûd bal kişand ser perwedeyên ji bo berhemên destan ku didan zarokan û jinên ciwan û xwest ku hemû jin fêrî berhemên destan bibin, vê çandê biparêzin û wiha bi dawî kir: “Demek min di qada çand û hunerê ya navçeya Tirbespiyê de kar dikir. Li wê derê min perwerde dida jinên ciwan û zarok fêrî berhemên destan dikir. Du pêşangeh min li navçeya Tirbespiyê vekirin û bi berhemên xwe û yên şagirtên xwe tevlî bûm. Dixwazim pêşangehên mezin li bajarên me werin vekirin. Ji bo ku her jin berhemên destên xwe nîşan bide, eleqe çêbibe û ev kevneşopî were parastin.” **NÛ JINHA**

## bi kamîreya ronahî




Pêşengeha Şehîd Herekol

## FERHENGA BIWÊJAN

**Lingên wî erdê nagirin:**
- Keyfa wî pir tê; pir kelecan digire.

**Lingên wî li hewa ne:**
- Pir bikeyf e; yê keyfê ye.

**Lotikan dide xwe:**
- Pir bikeyf e; ji keyfa dilîze.

**Mala Xwedê ava:**
- Dilê min xweş bû.
(Dema yek li bendê be ku tişteke xirab biqewime, yan tişteke xirab bihîstibe, lê wisa dernakeve hingê dibêje).

**Miriyê xwe bir nava miriyan:**
- Bi şahiyeke mezin şa bû.

**Ne lolo ye ne lêlê ye:**
- Bi serê xwe ye; bêzarok e; bêpirsgirêk e.

**Pehniya wî nediket erdê:**
- Ji keyfa êdî nizaniya ka çawa bike.

**Per bi min ve çêbûn:**
- Keyfa min pir hat:

**Perên min bilind bûn:**
- Bi heman wateyê.

**Per jê kêm bûn ku bifire:**
- Keyfa wî pir hat.

**Per û baskên wî hebûna wê bifiriya:**
- Bi heman wateyê.

**Pê li malê xwekiriye:**
- Dixwe, vedixwe û keyfa xwe dike.

**Pêşiya camêriyê nayê girtin:**
- Ku tu bikî bike; ti kes nabêje te neke.
(Dema yek dibêje; ezê tişteke baş bikim derbarê wî de tê gotin)

**Piyê wî erd nedigirt:**
- Ji keyfa êdî nizaniya ka çawa bike.

**Qazî rabû miftî şa bû:**
- Dema yê mezin çû keyfa yê piçûk hat.

**Req ketin avê xwe dan tavê:**
- Her tiştî li gorî keyfa xwe dike; li gorî xwesteka xwe tev digere.

**Rişka xwe jê bir:**
- Jê têr bû; gihat dawiya keyfa xwe.

**Serê hespê xwe berda:**
- Bi nav ve çû; pêşiya wî vebû; êdî nesekinî.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

# Komploya li dijî jiyana azad



Gelê Kurd yek ji wan gelên kevnar ên Rojhilata Navîn e. Di demên cuda yên dîroka kevnar de bi çand û huner û bi siyaseta xwe bandorê li erdnîgariyeke berfireh a dinyayê kiriye.**R-5**

# Xebata belavkariyê û rewşa xwendina rojnameyê



Saziya Ronahî ya Belavkariyê, erkdara belavkirina rojname, kovar û hwd… ne. Bi awayekî rojane xebatê dike, belavkarê wê Mihemed Xêr Çolî da zanîn ku bûye zêdeyî 10 salan, ew rojnameya Ronahî, rojnameyên din û kovaran li Qamişlo belav dike. **R-6**

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1213 | 16-Cotmeh-2024 | www.ronahi.net/ku/ | Nirx: 500 L.S

# Di nav zehmetiyên koçberiyê de, hêviya vegerê




Jina bi navê Wedha Hisên ku piştî dagirkirina Serêkaniyê di cotmeha 2019’an de neçarî koçberiyê bûye û 5 salin li kampa Telai dimîne, diyar kir ku ew ê herdem bi hêviya vegera li ser axa xwe jiyan bikin.**R-4**

# PÊŞANGEHA Ş. HEREKOL ÇAVKANIYA WÊJE Û ZANISTÊ YE

Bi serperştiya Desteya Çandê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê, bi alîkariya Desteya Çandê ya herêma Cizîrê û bi dirûşmeya **‘Ka Em Xwendinê Bikin Şêweyekî Jiyanê’** 8’emîn Pêşangeha Pirtûkan a Şehîd Herekol li bajarê Qamişlo dest pê kir û wê 8 rojan dewam bike. Di pêşengehê de 54 weşanxane û saziyên wêjeyî bi 143 hezar pirtûk û 15 hezar serenavan beşdar dibin. Pêşengeha Şehîd Herekol a Pirtûkan ji bo civakê bûye çavkaniya wêje û zanistê.**R-3**



# Ji Çiraxên huner û wêjeya kurdî



Helbestvan Mihemed Ebdul Ezîz. Yek ji navdarên çand û wêjeya Rojavayê Kurdistanê ye. Ji demên kevnar ve, wêjeya Kurdî roleke bingehîn lîstiye ku Kurd bi girîngiya parastina nasname, ziman, dîrok û çanda xwe û pêşxistina yekîtiya neteweyî û mayendeya neteweyî ya Kurdan hîs bikin.**R-7**

# Hilbijartinên têkbirina hişmendiya PDK’ê



Namzetê Tevgera Helwest ya Dihokê Bedel Berwarî da xuyakirin ku hilbijartinên parlementoya Herêma Kurdistanê, ne tenê di navbera YNK’ê û PDK’ê de ne û ji bona hilbijartin bi şewazekî ewle û coş derbas bibe, me amadekariyên xwe xurt kirin.**R-3**

17 salî ye û temenê keça wê 4 salî ye — Nehîr Pale — R-2


Çareserî bi şerê taybet na bi hiqûqê pêkane! — Dilyar Cizîrî — R-4

Dijminahiya Kurdan rê li ber çi vekiriye — Zekî Bedran — R-5


Lîstika Erdogan a Nû — Farûk Sakik — R-5


Nirx û dewlemendiyên civakê — Rohat Bulut — R-6


Bila Xwendin Bibe Şêwaza Jiyanê — Kemal Necim — R-7

# Di Saziya Belavkariyê de rola jin sereke ye

Jinên ku di saziya belavkariyê de cihê xwe digrin diyar kirin ku ew hewil didin Rojanameya Ronahî bighînin tevahî civakê, herwiha ew ê herdem bi hezkirineke mezin xebata xwe berdewam bikin.

**Lîloz Hisên/Qamişlo**



Rohat Hemê



Dîlber Ebas



Rîm El-Eîd

Li her çar parçeyên Kurdistanê her dem hewildan hebû ku dezgeh û saziyê raghandinê werin avakirin, lê ji ber hêzên dagirker û desthilatdar ev yek dihat asteng kirin. Yekemîn rojnameya kurdî di dîroka Kurdistanê de, bi navê 'Kurdistan' di 1898`an de li Misirê dest bi weşanê kir, lê ji ber zexta Osmaniyan rojnameyê tenê 8 salan dewam kir. Rojname li hin deverên Ewropayê geriya. Piştre di 1909`an de rojnameya Kurdistan hate girtin.

Di sala 2011`an li Rojavayê Kurdistanê rojnameya Ronahî hate damezrandin, tevî astengî û êrişan jî rojnameyê kar û xebatên xwe berdewam kir. Rojnameya Ronahî di 2011`an de li taxa Şêxmeqsûd a bajarê Helebê dest bi weşanê kir. Ji ber zextên hikumeta Şamê tîma rojnameyê neçar ma berê xwe bide Qamişlo, Kobanê û Efrînê. Li Qamişlo navenda giştî bi her du beşên xwe yê erebî û kurdî hat avakirin. Duvre kovara Mizgîn ya taybet bi zarokan jî hate avakirin. Jinan jî di rojnameyê de roleke berbiçav lçstin û li her cihê xar û xebat dan meşandin.

Di heman demê de di saziya belavkariyê de jî jinan cihê xwe girt û bi roleke sereke lîst. Jinan ji bo ku rojname bighêje her derê, xebteke girîng dan meşandin.

Derbarê rola jinê di saziya belavkariyê de, jinên ku cihê tê e digrin ji rojnameya me re axivîn.

Jina bi navê Rohat Hemê ku yek endamên belavkriyê li bajarê Amûdê ye di destpêka axaftina xwe de wiha got: "Çar salan min karê belavkariyê kir, piştre min karê rêveberiyê di beşê belavkariyê de da meşandin. Ji bo ku Rojnameya Ronahî bighêje destê her kesî, me xebateke mezin da meşandin. Asta xwendina rojnameyê başe, em vê yekê di rêya pirsên ku xwendevanan ji me dikin, tekez dikin. Rojname li tevahiya herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê tê belavkirin di hefteyê de 10 hezar û 200 rojname tên belavkirin, hejmara kopiyên çapkirî yên erebî 6 hezar û 300, ya beşê kurdî jî 3 hezar û 900 . Em wekî jin heta astekê me dikarîbû di beşê belavakariyê de, xwendina rojnameyê di nava civakê de bidin qebûl kirin."

Rohat Hemîd Hemê wih got: "Ez pir kêfxweş dibûm dema min rojname belav dikir û civakê daxwaza zêdekirina hejmaran dikirin, ji vê yekê tê xuyanî kirin ku civak heta astekê baş rojnameyê dixwîne. Hestekê xweş bi min re çêdibû dema min ked dikir weke jin di vî warî de, da ku rojnameyê bighînim civakê."

Asta xwendin û şopandinê di van salên dawî de kêm bûye, ji ber bikaraîna medyaya civakî, lê tevî vê yekê xwendina civakê ji rojnameyê her ku diçe zêde dibe. Ev tê wateya ku heta astekê rojname karîbû xwe bighîne civakê, pirsgirêk û dozên civakî derxîne pêş da ku çareserî bê danîn.

Di heman çarçoveyê de Dîlber Ebas ku ew jî yek endamên belavkariyê li bajarê Qamişlo ye wiha got: "Beriya 5 salan min desty bi karê belavkariyê kiriye, li gorî ku ez dibînim di dema belavkirina Rojnameya Ronahî de, civak xwendina rojnameyê meraq dike, herî zêde jî nûçeyên siyasî û meydanî dixwînin, ev jî ji ber şert û mercên giştî ku herêm tê de derbas dibe. Wekî ku jinê cihê xwe di tevahiya aqadan de girt, di qada belavkariyê de jî rola jinê sereke bû. Ez wekî jineke belavkar bi karê xwe sebilind im. Herwiha ez bang li jinan dikim ku êdî sînorên adetên kevin bişkînin, bi rehetî tevlî warên jiyanê bibin. Ez serkeftinê ji her jineke xebatkar dixwazim ku dibe alîkar di pêşxistina civaka xwe de.

Derbarê heman mijarê jin ji pêkhatiya ereb ya bi navê Rîm Hemîd El-Eîd da zanîn ku di tevahiya qadan de jinan xwe isbat kirin û wiha got: "Beriya şoreşa 19'ê Tîrmehê giştî kar ji bo jinê pir zehmet bû, ne tenê di karê belavkariyê de, di hemû waran de, lê piştî şoreşê her sal derbas dibe jin xwe di cihên cuda îsbat dike û di hemû waran de xebatê dike. Di heman demê de hin malbat hîn jî qebûl nakin ku keçên wan kar bikin dervî malê û gelek jin jî ev sînor şikandin û bi îradeyeke mezin derketin û kar kirin. Li gorî min rêjeya xwendina rojnameyê ji sedî 50 tê xwendin, ji ber ku hin xwendevan carnan pirsa nûçeyan, an jî rapor û hwd.. dikin, heta niha jî gelek kes hene ji xwendina rojnameyan hez dikin."

# Komîteya Aborî ya Kongra Star projeya Demsal berfireh dike

**Komîteya Aborî ya Rêxistina Kongra Star projeya Demsal a li Tirbespiyê berfireh dike. Jin destnîşan dikin ku ev proje derfetên kar û xweseriya herêmê bi dest dixe.**

Projeya Demsal a çandinî û sewaldariyê ya Aboriya Jin a Komîteya Aborî ya Kongra Star li navçeya Tirbespiyê ya girêdayî bajarê Qamişlo di sala 2015'an de hatiye avakirin. Di vê projeya ku bi 4 jinan dest pê kir de nêzî 100 jin kar dikin, tê de çandiniya hemû cureyên çandiniyê yên her çar werzên salê hene. Her wiha sewaldarî jî heye. Proje ji bo ku derfetên zêdetir û berhemên bêtir peyda bike berfirehtir dibe. Berdevka Komîteya Aborî ya Kongra Star Gulê Murad têkildarî projeyê axivî.

Gulê Murad diyar kir ku ew ji bo armancên xwe projeyê ji sala 2015'an ve heta îro berdewam dikin û wiha dest bi axaftina xwe kir: "Proje biçûk û sînordar bû. Bi demê re mezin bû, pêşketin çêbûn. Niha hejmara jinên ku cih digrin di projeyê de, nêzî 100'î ye. Ev jin ne tenê ji bo qezenckirina pere li vir in, ji bo kesayeta xwe bi hêz bikin jî dixebitin û fêrî kar dibin niha gihaştine asta pisporiyê. Jin li vir jî çandinî û sewaldariyê fêm dikin. Demsal di nava xwe de çandiniya sebze, fêkî, çandina genim, nîsk û ceh dihewîne. Her wiha sewaldarî, berhemên dest jî hene mîna ava bacanên sor û îsotan."

**'Ji bo herêm û jinan xweseriyek e'**

Gulê Murad teqez kir ku ev proje ji bo herêmê gaveke girîng e û got: "Ev proje gelek girîng e, ji ber ku ji armancên me yên sereke bidestxistina xweserî û xwetêrkirina herêmê ye di aliyê peydakirina pêdiviyên jiyanê yên sereke ji xwarinê bêyî ku herêm hewcedarî berhemên derve bibe."

Gulê Murad diyar kir ku ew ji bo pêşxistina jinan di warê proje û bîrdoziyê de dixebitin û wiha pê de çû: "Di heman demê de ji bo peydakirina derfetên kar ji jinan re. Gelek jin ji malên xwe derneketibûn û tevlî koperatîfan nebûbûn. Jinan piştî ku di projeyê de cih girtin, girêdaneke wan çêbû, xwe xwediyên projeyê dibînin, dixwazin bi pêş bixin. Hêjayî gotinê ye ku em girîngî didin perwerdekirina jinan a îdeolojîk li ser parastin, azadî, rêbaz û mafên wan."

**Werza berhemdayîn û berfirehkirina projeyê**

Gulê Murad da zanîn ku ew amadekariyên werza salê ya nû dikin û wiha berdewam kir: "Her werzek şînahiya wê cuda ye. Niha em amadekariyên werza payîzê dikin. Sera tên amadekirin her wiha sewal jî di pêvajoya zayînê de ne. Li aliyekî din, em amadekariya vekirina dikanek dikin, ji bo firotina berhemên ku ji vê projeyê derdikevin, dibe ku derfetên her kesê tunebin ji bo werin cihê projeyê loma em dikanê vedikin ji bo her kes bikaribe berheman bikire."



**Bandora germê û qutkirina avê**

Reca Mixlif a ji sala 2020'an weke karker cihê xwe di projeya Demsal de cih digre. Dibêje ku tevî pileyên germê û qutkirina avê xebatên xwe berdewam kirine û wiha pêde çû: "Dibe ku hinek bandora neyînî li berhemên çandiniyê bûbe ji ber ku pileyên germê îsal bilind bûn. Di heman demê de qutkirina elektrîkê jî bandora xwe kir. Berhema sala borî baştir bû."

**'Ji bo me derfet e'**

Reca Mixlif tekez kir ku projeya Demsal gelek derfet ji wan re pêşkêş kirine û wiha bi dawî kir: "Vê projeyê gelek derfetên kar ji jinan re peyda kir, wekheviya di navbera jin û mêr de pêk hat. Em ji bo hemû cureyên çandiniyê, yên hemû werzên salê dixebitin. Eger em bînin gel hev, navbera dema destpêkê dema ku ez hatim û niha de gelek pêşketin çêbûne. Kar zêde bû, derfetên kar jî pê re zêde bûn. Eger jinek kar bike, dikare malbata xwe jî xwedî bike."

**NÛ JINHA**

## Ji Pênûsa Jin

### 17 salî ye û temenê keça wê 4 salî ye

Nehîr Pale

Selam 4 salî ye û dayîka wê 17 salî ye, her du jî zarok in. Bavê Selam 10 salan ji dayîka wê mezintir e. Ew ji bajarê Idlibê yê Sûrî ne û niha jî li Reqayê bi cih bûne. Çima dayîka Selam ketiye rewşa ku hîna zarok e û keçeke wê ya 4 salî heye? Sedema dayîka Selam ketiye vê rewşê de em nikarin bibêjin tenê malbata wê ye. Hîna temenê wê biçûke dayîk û bavê wê dev ji hevdû berdidin û ev sedemeke sereke ye ku rasterast bandorê li ser jiyana dayîka Selam bike.

Dayîka Selam jî mîna hemû keçên di temenê xwe yê biçûk de hatine zewcandin wenda bûye. Şert û mercên ku ew niha tê de ye, lihevnekirina wê û hevjînê wê dibe ku bibe sedema gelek pirsgirêkan. Ew hêza wan nîne wate bidin her tiştî û tehemul bikin. Ew bi xwe dibînin zarokên di temenê wan de hîna li kolana ne yan jî dixwîn in. Nikarin têkevin nava civakê de, xweşî û xemgîniyên civakê parve bikin û bibin parçeyek ji civakê. Mêr di têkiliya xwe ya bi jinê re wê ji civakê qut dike, di bin navê ol, exlaq, şeref û namûs de ji her tiştî dûr dixîne. Jin carne dighîjin rewşa ku nema bizanibin baxivin. Hemû wextî di malê de ne û kesekî nabînin. Dunya wan gelekî teng dibe, eger zarokên wan nebin dighîjin rewşa her tim moralê wan ketîbe û hêvî di wan de were kuştin. Ji xwe mêrê zayendperest bi hurmet nêzî jinê nabin û bi rêbazên hişk nêzî jinê dibin. Wê demê ew zaroka biçûk wê çawa di xwe de nûbûnê çêbike, wê çi bibe çavkaniya hêviya wê û heyecana xwe zindî bihêle? Ji civatbûyînê qut dibin û mêr jî bi edalet û wekhev nêzî wan nabe.

Eger zarokên keç di temenekî biçûk de têne zewcandin û ji aliyê malbata xwe ve têne firotin wê demê çima civak behsa edaletê dike. Ev bê edaletiya herî mezin e û di civakê de asayî bûye. Mêrê 80'î salî ji ber ku pereyên wî hene dikarin bi keçên 20 salî re bizewice, xeyalên wan dikuje, wan ji xwe re dike xizmetkar û civak jî li beramberî vê yekê bêdeng dimîne. Ne tenê bêdeng dimîne asayîkiriye û bi exlaq ve nadin girêdan. Çima keç hîna di temenekî biçûk de têkeve rewşa ku her tim hewl bide xwe bi hevjînê xwe bide qebûlkirin. 24 saetan xizmeta mêr dike û kesek bi hurmet nêzî ked û westandina wê nabe.

Ji ber zewaca zarokan niha berdan gelekî zêde bûye, êdî di encama wê de rêbazên bêrehmet li hemberî jinê têne bikar anîn. Jina ku dev ji hevjînê xwe berde weke destê duyemîn lê dinêrin û ji carekê zêdetir wê didin zewcandin.

Dayîka Selam û hemû zarokên keç qurbanên zayendperestiyê ne, dikevin xefka malbatê de û nema dizanin xwe çawa jê rizgar bikin. Ji xwe di wan şert û mercan de kesek bi wan re nabe alîkar û neçarin bi xwe li ser piyê xwe bisekinin an jî wê mirinê ji xwe re çareserî bibîn in.



# Ji Çiraxên huner û wêjeya kurdî

**Can Yûsif**

Helbestvan Mihemed Ebdul Ezîz. Yek ji navdarên çand û wêjeya Rojavayê Kurdistanê ye. Ji demên kevnar ve, wêjeya Kurdî roleke bingehîn lîstiye ku Kurd bi girîngiya parastina nasname, ziman, dîrok û çanda xwe û pêşxistina yekîtiya neteweyî û mayendeya neteweyî ya Kurdan hîs bikin, û ew ji bo ronîkirina nirx û prensîbên neteweyî û belgekirina dîrok û şaristaniya kurdan tevkariyê dike.

Nivîskar û helbestvanên Kurd roleke diyarker di vejandina ruhê netewî û çandî de û xurtkirina nasnameya netewî ya Kurd ji bo gelê Kurd lîstine.

Helbestvan Mihemed Ebdulezîz (Bavê Fener) yek ji wan nivîskarên Kurd tê hesibandin ku di parastina nasnameya çanda Kurdî û bihêzkirina nasnameya neteweyî ya civaka Kurd de roleke berçav di vejandina hestên netewî û xurtkirina girêdana neteweyî ya gelê xwe yê Kurd li herêmê de leyîstiy .Helbestvan û nivîskar Mihemed Ebdulezîz Heso (Bavê Fener) di sala 1954'an de li gundê Gira Sorê Heso yê girêdayî bajarê Dêrikê ji bav û dayîkek Kurd (Ebdul Ezîz Heso û Amna) hatiye dinya yê.

Ew di nava malbateke Kurdperwer a welatparêz de mezin bûye, ku nirxên Kurdayetiyê parastiye û hesreta azadiyê ye û ji bo doza xwe, azadî û rizgariya welatê xwe tiştên herî giranbuha û hêja û baştirîn zarokên xwe kirine qurbanî jê re. Zarokatiya xwe li gundê Eyn Dîwarê, li kêleka Kaniya Xeyda û Pira Bafitê, li qeraxê çemê Dicleyê û di nav darên hêjîr, tirî û tûyan ên baxçeyên Eyn Dîwarê de derbas kiriye.

Ew torînê malbateke kurdperwer û welatparêz e, heskerê zanist, wêje û çandê ye, ew kurê helbestvanê kurd ê nemir û navdar Ebdulezîz Heso ye. Ew ji pestînên pêlawazên helbestên bavê xwe têgeheşte û ji kaniyên lehengiya Simkoyê Şikakî vexwartiye, ew fêrbûye ji çavkaniyên zanîn û çanda dixtor Kendal, Zinar û Sozdar, ji xumxuma pêlên çemê Dîcle û hêrsa çiyayê Cûdî yê bi heybet û ji xuşxuşa ava Kaniyên Eyn Dîwerê hînî helbestê bûye, Li ber destê bavê xwe û Şêx Ehmedê Salih û Osman Sebrî û helbestvanên din ên kurd hatiye fêrkirin .

Qonaxa seretayî li gundê Gira Sorê Heso xwendiye û dibistana navîn û amadeyî li bajarê Dêrikê yê Rojavayê Kurdistanê xwendiye û pişt re li bajarê Şamê li Kulîjeya Wêjeyî, beşa Dîrokê, navê xwe tomar kiriye û ji ber windabûna ronahiya çavên xwe nekiriye xwendina xwe ya zanîngehê biqedîne. Berî ku bînahiya çavê xwe winda bike li çend gundên Dêrikê (Meşûq, Eyn Dîwar, Gira Sorê Heso, Banê Şikeftê û Hecî Harûn) mamostetî kiriye. Di nîvê salên heştêyî yên sedsala borî de dest bi nivîsandina helbestê kiriye û gelek helbestên netewî û şoreşgerî nivîsandine di pesnê Kurdistanê û rûmeta şoreşger û şehîdên azadiyê de.

Tevî ku ronahiya çavên xwe winda kir, ew di şûna dîtinê de bi têgihiştinê bi ser ket û tarîtiya ku daketibû ser çavên wî karîbû belav bike û nîgarên yên ku ji wan hez dikir vegerîne di nav dîmenên tijî bedewî de, berovajî tariya ku di çavên wî de diqewime, em di helbestên wî de dibînin lehiyeke ronahiyê ku ji pencereyan an deriyan der dibe da ku riya azadiyê ji nifşên pêşerojê re ronî bike. Pirsgirêka dîtinê bi helbestvan Mihemed Ebdil Ezîz re di destpêka ciwaniya xwe de û di dema bilindbûna kariyera xwe de di sala 1985'an de dest pê kir, dema ku dîdeyên çavên wî tarîbûn, piştre şebeka bînahîya herdû çavan lê dide, ew bû sedem ku wî di sala 1990'î de jiyana dîtinê bi tevahî winda bike, tevî gelek hewildanên dermankirina wê li Şam, Tirkiye û Rûsyayê, lê bê encam bû. Lê wendakirina bînahiya çavê wî ew ji xeyalên wî dûr nexist û riya xwe berdewan kir û li hember azweriya xwe, stratejiyek ji bo domandina afirîneriya xwe ya wêjeyî pêşxist, li ser wan teknîkên hestiyarî ên li ser destdan û dîtinê nesekinî, lê belê wî xwe sparte pêvajoyên têgihiştinî û zanînê û wan bi hev ve girêdide û berhemên xwe yên wêjeyî diafirîne, û xwe dispêre bîrdankê. Bîr, xeyal û têgihiştin di afirandina bedewiya nivîsandina helbest û tabloyên wî yên edebî de bûne temamkerê dîtin û amûrên wî .Dîrok ji bo me parastiye ku piraniya zanyar, xwedan pirtûk û helbestvanên ku pirtûkxaneyên wêjeyî û çandî yên din yên navneteweyî dagirtine, ew ne xwediyê dîtinê bûn bi qasî ku xwedanê têgihiştinê bûn, ew bi xwe kesên xwedanê sebir û zîrek bûn û bi zanebûnê xwe ji vê yekê, wan buroyên serdema xwe û serdemên ku li pey wan dihatin bi zanîna ku sûdê bide tijî dikirin, wan nivîskar, muzîkjen û zanyaran bingeh û prensîbên ku heya îro jî zindîne danîne.

Wendakirina bînahiya çavan tucaran ne bûye buhane û asteng, ji ber ku ew hestên din şiyar dike, dihêle ku pê bibînin û ew teşwîqek an beramberîyek bi şiyana xwe ya dayînê dide xwediyê xwe ji ber ku yê ku herî zêde wateya tunekirinê fam dike ew e.


Heger nivîsandina helbestê bi dîtinê ve girêdayî be, wê demê îlhama helbestê xwe dispêre têgihiştin û paqijiya dil û ev yek bi serpêhatiyên helbestvanên kevnar ên di dîrokê de hatiye îsbatkirin ku ew kor bûn ne didîtin, lê di pesndan, vegotin û ronîkirinê de pir jêhatî bûn, tiştê ku eşkere dike ku ruhê rastîn ê afirandêriyê tiştek nepenî ye ku bi kûrahiya giyanê mirov ve girêdayî ye û beşek ji nehêniyên mirovî ye, wek: (Homîros, Ebû El-Ala El-Mearî, Beşar Bin Berd, John Milton, Taha Husên, hwd.)

Helbestvan Mihemed Ebdil Ezîz Heso tevî zor û zehmetiyên xwe û ji destdana dîtina çavên wî û tevî zextên siyasî û gefên ewlekariya Sûriyê ku rastî wî hatin, wî qisûr nekir, ew nesekinî û kêliyekê jî ji erkên xwe, ji prensîbên xwe, û ji nirxên xwe yên netewî dudilî nebû, her wiha kêliyekê jî dudilî nekiriye ku lêdana dilê xwe neguvêşe, ji bo berdewamiya nivîsandina helbesta ku layîqê welatê xwe yê her bedew bibîne.

Wî tu carî pênûsa xwe ranekir da ku diwêta (ximava)wê zuwa bibe, û qîrîna pênûsa wî ya li ser rûpelan her gav li asoyê bilindtir dibû. Ew beşdarî pêşkêşkirina bernameyên gelek ahengên welatpetwerî, pîrozbahiyên neteweyî û cejnên Newrozan bûye, her wiha beşdarî gelek şevbuhêrkên helbestan û festîvalên wêjeyî û çandî yên ku li herêma Cezîrê dihatin lidarxistin bûye .Ji berhemên wî yên wêjeyî (edebî), wî gelek helbestên welatparêzî, şoreşgerî û evîndarî bi şêweyekî kilasîk ê terazû û pexşan ê xurt nivîsandine. Gelek helbestên wî di rojname û kovarên edebî û çandî yên kurdî de hatine weşandin.

Ji bo êş û azarên gelê kurd, ji bo welat û azadiyê, ji bo şehîd û dozê, ji bo şoreşger û lehengên Kurdistanê, ji bo sembol û pêşengên Kurdan, ji bo hezkirin û jiyanê, ji bo jinan û berxwedanê wî helbest nivîsîne. Ji bo komên gelêrî û hunerî yên bajarê Dêrikê komek nivîsarên (tekstên) şanoyê û skeçan nivîsandine .Dîwaneke wî ya helbestan bi zimanê kurdî amede ye li ber çapkirinê ye.

Helbestvan Mihemed Ebdulezîz yek ji navdartirîn rewşenbîrên Kurd li herêmê tê hesibandin ku hesta niştimanperwerî û nasnameya Kurdayetiyê tîne ziman, Kesayetiyek duriste ku bawerî bi ramana welat, neteweperweriya kurd û vebûna ji cîhanê re aniye, helwestên wî ji tu kesî nayê veşartin û helbestên wî pabendin bi mijarên welat, şoreş û berxwedanê ve, bi baldarî helbestên xwe dinivîse ji aliyê mebest û naverokê ve, her wiha pabede bi kêşanên helbestê ve, ew helbesta azad dinivîse,her wiha helbestên kilasîk û pexşan jî dinivîse. Gelek helbestên wî ji aliyê hunermend û komên hunerî yên Kurdî ve bûne stran û Hunermend û komên hunerî yên Kurd wek (koma Cûdî ,Elî Gavan) ew stran gotine.



Ji helbestên wî yên herî navdar ku ji aliyê hunermend û komên hunerî yên Kurd ve hatine gotin:

1- Helbesta "Ey Şêxê min ", ji aliyê hunermend Elî Gavan ve hatiye çêkirin û strandin.

2- Helbestek li ser şehîd Xebat, ji aliyê nemir Zîdan Şêx Qasim ve hatiye çêkirin û strandin.


3- Helbesta "Erê Şehîd" ji aliyê Diljan Cûdî ve hatiye çêkirin û ji aliyê koma Cûdî (Sebrê Torî) ve hatiye gotin.

4-Helbesta "Biranîna Dîrokê" ji aliyê hunermend Ednan Bavê Hêco ve hatiye çêkirin û ji aliyê koma Cûdî ( Sebrê Torî) ve hatiye gotin.

5-Helbesta "Çerxa Felek" ji aliyê Ednan bavê Hêco ve hatiye çêkirin û ji aliyê Koma Cûdî ( hunermend Nihad Diyab) ve hatiye gotin.

Helbestvan Mihemed Ebdulezîz di cîhana çand, wêje û afirînerê de yek ji sembolên girîng tê hesibandin, hertim hewl dide ku welat û neteweya xwe bilind bike û berevaniya nirxên wê bike, wî helbestên xwe ji bo stranbêjiya rûmeta welatê xwe û dîroka wî bi kar anîne, û parastina nasname û reseniya wê kiriye. Wî bi helbest û nivîsên xwe û beşdarbûna di çalakî û semînarên çandî û wêjeyî yên herêmê de, roleke berçav di tevgera çandî ya neteweyî de lîstiye. Hêviya tendurustiyek baş, serkeftin û afirîneriya zêdetir ji bo wî dixwazim.

## Têbînî



### Bila Xwendin Bibe Şêwaza Jiyanê

Kemal Necim

Guhpêdana xwendinê ku bibe reftareke rojane di nava civakê de bi taybet di nava ciwan û nifşên nû de rûdaneke pir girîng e, ji girîngî û rola xwendiê ye di hemû qadên civakî, derûnî, hestyarî û zanînê de. Ji ber xwendin dibe egera pêşketina ramana rexneyî, afirînerî, xwebawerî û fêrbûn û bilindkirina nirxên ramyarî û çandî. Xwendin binyada avakirina nifşên siberojê û pêşengên pêşerojê ye. Xwendin weke pir zaniyar û pêşeng dibêjin roniya hiş, xurdeyê giyanê ye û rêya zanebûnê ye.

Her çiqas mirov bêhtir bixwîne zanîn û agahiyên wî mezintir dibin, rewşenbîriya wî pêş dikeve, sinc û exlaqê wî paqij dibe û dê zanibe rastî û şaşiyan ji hev derxîne, her wiha dê nirxê kevneşopî û çanda civak û welatê xwe bêhitir nas bike.

Di demên dawî de, li gelek civakên cîhanê pirsa kêmxwendinê dikeve rojeva ragihandinê û navendên lêkolînan. Lê ev arîşe li gorî civakan tê guherîn. Li civakên ku ji berê de xwendin ji bo kesên civakê bûye reftareke jiyanê, niha behsa arîşeya guherîn û pêşketinên teknolojî dikin, ku bûye sedem xwêner li şûna xwendina pirtûkan berê xwe bibin şêweyên din ên xwendin yan jî wergirtina agahiya.

Lê li civakên şûndemayî, ku ji berê de xwendin nebûye reftar, lê tenê di nava beşekî civakê de maye, arîşeya ku tê behskirin a kêmbûna xwendinê bi giştî ye. Lewma pisporên perwerdeyê û zanyar û lêkolîner hewil didin ku li sedeman bigerin û li gorî wê hin bername û planên çareseriyê deynin.

Li gorî hin pisporan, berpirsê yekem yê kêmbûna çanda xwendinê li ba kesan, malbat e. Ji ber ku malbat qada pêşî ya avakirina takekes û avakirina kesayetiya zaroan e, berpirsiyariya wê ye ku hezkirina xwendinê di dilê zarokên xwe de çêbike û wan fêrî wê reftarê bike, wan bibe pirtûkxaneyê da ku pirtûkên bikêr û sûd bikirin, wan têvedin ku ew bi xwe pirtûkan hilbijêrin. Pêwîst e di malan de pirtûk li dora zarokan û nêzî wan hebin.

Aliyekî din yê berpirsyar, dibistan in. Dibistan dikarin hezkirina xwendinê di nav xwendekaran de pêş bixin. Ji bo hezkirina xwendinê pêwîste dibistan xwendekaran fêr bikin ku di temenê biçûk de têkevin pirtûkxaneyê, her wiha pêwîste demên ji bo xwendinê bêne veqtandin, pirtûkên balkêş û nûjen ên ku bala xwendekaran dikşînin bêne peydakirin, hêsankirina awayên deynkirina pirtûkan, lidarxistina pêşangeh û semîneran li dibistanê, û xwendekaran bibin pirtûkxaneyên giştî.

Her wiha ji aliyên desthilatdar (Dewlet, Rêveberî HWD), tê xwesitn ku der barê mijarên çandî û ramyarî de polîtîkayên xwe yên diyar hebin, û guh bide pirtûkan û pirtûkxaneyan û peydakirina wan ji kesan re hêsan bike, ku mafê her welatiyekî heye bighêje zanînê. Her wiha roleke girîng dikeve ser milê saziyên civaka sivîl ku guh bibin bername û çalakiyên geşepêdana ramyarî.

Di van rojan de, li bajarê Qamişlo 8`mîn Pêşangeha Şehîd Herekol Ya Pirtûkan tê lidarxistin. Durişmeya pêşangehê ya vê sale jî pir balkêş e "Em xwendinê bikin şêwazeke jiyanê". Pêwîste ev durişme her wiha bibe ya civakê, malbatan, dibistan û zanîngehan, saziyên rêveberiyê û saziyên civaka sivîl, û bi hev re berê xwe bidin pêşangehê, bila xwendin bibe şêwaza jiyanê.

# Xebata belavkariyê û rewşa xwendina rojnameyê

Saziya Ronahî ya Belavkariyê, erkdara belavkirina rojname, kovar û hwd… ne. Bi awayekî rojane xebat dike, belavkarê wê Mihemedxêr Çolî da zanîn ku bûye zêdeyî 10 salan, ew rojnameya Ronahî, rojnameyên din û kovaran li Qamişlo belav dike. Herwiha xwînerê rojnameya Ronahî diyar kir ku ji destpêka damezrandina rojnameyê ve, ew wê dişopîne.

**Hemza Sêvo/ Qamişlo**

Saziya Ronahî ya Belavkariyê saziyeke mijûlî xebata belavkirina berhemên çapkirî dibe. Ev sazî di sala 2014'an de weke navendekê dest bi xebatê kiriye. Ji wê demê ve hejmarek ji rojname û kovarên xwecihî, hem jî yên herêmî li Bakur û Rojhilatê Sûriyê belav dike. Rojnameyên ku belav dike 5 in, weke Rojnameya Ronahî, ya Rojava, ya Serxwebûn, ya Sûrî û hwd… Li aliyekî din jî 10 kovaran jî li xwîneran belav dike, ji wan Kovara Sîwan, Şermola, Destar û hwd…

Li gel blavkirina rojname û kovaran jî, Saziya Ronahî gelek pirtûkan jî diweşîne. Lê tişta herî berbiçav di warê belavkariya Saziya Ronahî de belavkirina hejmarên Rojnameya Ronahî ye. Rojnameya Ronahî di 16 Cotmeha 2011'an de hat damezrandin. Rojnameya Ronahî ya ku rojane bi beşa erebî, hem jî di heftiyê de bi beşa kurdî li ser asta du rojan hejmarên xwe yên çapkirî û iliktronîk derdixe, bi riya Saziya Ronahî re hejmarên çapkirî tên belavkirin. Her cara ku rojname tê çapkirin, 10 hezar û 300 hejmar digihe ber destên xwîneran li ser asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê. Beşa kurdî 4 hezar hejmar û beşa erebî 6 hezar û 300 tên çapkirin û belavkirin.

Hêjayî bi bîrxistinê ye ku 70 endam di nava vê saziyê de cih digirin, piraniya wan belavkarên rojname û kovaran in, 21 ji wan jin in.

Lewma jî bi awayekî rojane Saziya Ronahî ya Belavkariyê ji bo gihandina rojnameyan ber destê xwîneran kar û xebatê dikin.



**Mihemed Xêr**

Têkildarî mekenîzma xebata Saziya Ronahî ya Belavkariyê, endamê wê, Mihemedxêr Çolî, pê re jî yek ji xwînerê Rojnameya Ronahî Mihemed Salih Hisên ji rojnameya me re axivîn.

### Kar û xebata belavkariyê

Mihemedxêr Çolî girêdyî belavkariya Rojnameya Ronahî wiha got: "Ez yek ji belavkarên Saziya Ronahî me, ji bajarê Hesekê me, lê weke belavkar li bazara bajarê Qamişlo Rojnameyan digerînim. Ji destpêka Şoreşa Rojava ve bi taybet di sala 2013'an de tevlî Saziya Belavkariyê bûme. Di heman demê de kovarên weke Sîwan, Şermola, destar û hwd… jî dighînim ber destê civakê. Di heftiyê du rojan, 210 rojnameyan bi herdu beşan li welatiyan belav dikim. Li aliyekî din gelek belavkarên din li Qamişlo hene, rojnameyan li pirtûkxane, saziyên cuda, partiyên Siyasî û kişkên taybet belav dikin. Lê weke rojname di destpêkê de Rojnameya Ronahî digihêjin ber destê saziya me, belavkar û tevahaiya endaman rojnameyan dixwînin. Xebata ku Rojnameya Ronahî dike xebateke serkeftî ye û cihê şanaziyê ye. Piştî ku em dixwînin li tevahiya civakê ser asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê belav dikin. Welatî jî bi kêfxweşî rojnameyan werdigirin."



**Mihmed Salih Hisên**

### Xwînerek asta xebata rojnameyê dinerxîne

Xwînerê Rojnameya Ronahî yê bi navê Mihemed Salih Hisên xebata rojnameya me wiha nirxand: "Ez yek ji xwînerên rojanmeyê me bi dirêjahiya damezirandina wê heta roja îro ez rojnameyê bi herdu beşan dixwînim û di heftiyê de du rojan digihêje ber destê min. Herwiha jî li ser malperê jî rapor, nûçe û hevpeyvînan dişopînim. Wekî tê zanîn Rojnameya Ronahî ji dezgehên pêşîn a raghandina Şoreşa Rojava ye. Bi boneya 13'emîn savegera damezrandina wê de, em spasiya hemû xebatkarên Rojnameya Ronahî dikin. Bi dirêjahiya 13 salan re, Rojnameya Ronahî erkek avêtibû ser milê xwe, ew erk jî pêk anî. Wê dikarîbû civakê ji hemû aliyan ve bi teyîsîne, çi di aliyê siyasî, yê civakî û yê çandî de be. "

### Giringiya xwendinê ji bo mirov, li hemberî wê jî kêmbûna asta xwendinê

Mihmed Salih Hisên têkildarî giringiya xwendinê bi taybet a rojnameyan wiha got: "Serkeftin û pêşketina welatan tev bi saya xwendinê ye. Ji bo mirov û civakê jî heman tişt e, mirov û civaka ku ne xwende be, ew civak û mirov vala ye, hem jî jiyana wan di tarîtiyê de he. Girîngiya xwendinê bi taybet rojnameyan jî ew e ku mirov pê ronî dibe, derdora xwe û rewşa hawirdorê nas dike. Ev yek jî bi riya xwendina rojname, pirtûk û hwd… çêdibe. Lê di dema heyî de mirov rastî rewşeke xerab û êşdar tê, ew jî kêmxwendin e. Mirov êdî di asteke kêm de radihêjin pirtûk û rojnameyan. Sedem jî pêşketina teknolojiyê ya ku bi riya wê mirov dikeve xefka şerê taybet. Civak tev jî dema xwe li ser Face Bookê derbas dikin. Eger rûdanek çêbibe yekser berê xwe didin Face Bookê û agahiyan belav dikin li milekî din li nûçeyan temaşe dikin. Ji bo mirovan negiring e, kîjan alî belav kiriye yan jî rast e yan na, lê nakevin malperên fermî, an jî ranahêjin rojnameyan û naxwînin. Da ku çanda xwendinê li cem civakê ava bibe pêwîste civak li cewherê xwe vegere. Herwiha jî dûrî sîstema ku kapîtalîzma nûjen li ser civakê daye ferzkirin, bike. Di heman demê de perwerdeyên girêdayî girîngiya xwendinê di nav hemû qadên civakê de werin dayîn."

# Dayika Şehîd Hevrîn: Em ê rêya şehîdên xwe bişopînin

**Dîlan Mulhim/Qamişlo**

**Dayîka şehîd Hevrîn Xelef Sûad Mistefa diyar kir ku ew ê peyam û armancên Hevrîn Xelef pêk bînin û wiha got: "Em soz didin ku rêya wê û tevahî jinên di oxira parastina doza welat û gel de canê xwe feda kirine, bişopînin. Herwiha ji bo avakirina Sûriyeke pirengî, demokratîk û nenavendî kar bikin."**

Hevrîn Xelef di sala 1984'an de li gundê Rêhanîkê yê girêdayî bajarê Dêrikê hatiye dinê. Di malbateke welatparêz de mezin bûye û zaroka herî biçûk bû di malê de, malbata wê ji 4 bira û xuşkeke bi navê Zozan ku di nava Tevgera Azadiyê de şehîd bûbû, pêk tê, dayîka Hevrîn bi Rêber Abdullah Ocalan re civiyabû û vê yekê hişt ku Hevrîn xwedî kesayeteke cihêreng be. Hevrîn xwendina xwe ya seretayî, navîn û amadeyî li dibistanên Dêrikê derbas kir, bi jîr û tabatiya xwe dihat naskirin. Wê ji zaroktiya xwe de berpirsyariya her tiştî digirt ser milê xwe. Hevrîn endezyariya Medenî di zanîngeha Helebê xwend, paşê bi destpêkirina şoreşa Rojavayê Kurdistanê re tevlî pêşengiya xebatên şoreşê bû.

Bi destpêkirina Şoreşa Rojava re, Hevrîn Xelef di gelek cihan de xebitî, weke Desteya Enerjî, Desteya Aborî, Rêveberiya Xweser û herî dawî jî, weke jineke siyasetmedar di 27'ê Adara 2018'an de Partiya Sûriyeya Pêşerojê ava kir. Hevrîn jineke xwedî zanist bû, di tevahiya xebatan de kar dikir û cih dadigirt. Di hevaltiya xwe de jî dirust bû, ji bo wê xwedî bandor bû û her kes nirxê wê dizanîbû.

Di derbarê jiyana şehîd Hevrîn Xelef de, dayîka wê Sûad Mistefa ji rojnameya me re axivî.

### Kirte jiyan Hevrîn

Sûad Mûstefa di destpêka axafita xwe de wiha got: "Dema ku Hevrîn hate cîhanê malbat gelekî kêfxweş bûn. Navê Hevrîn xalê wê yê şehîd lê kir, Hevrîn keçek dilnerim bû û kesên hewîrdora wê jê hezdikirin. Hevrîn di dibistana xwe de zîrek û jêhatî bû, xwesteka wê ji xwendinê re jî hebû, mamosteyên wê gelekî bi jêhatbûn û mereqa wê ji xwendinê re kêfxweşbûn. Herwiha Hevrîn di dibistana xwe de hertim ya yekemîn derdiket û di gelek pêşbirkan de beşdarbû. Û di sala 2009 an' de beşê endiziyariya çandiniyê li Zanîngeha Helbê xwend."

### Kar û xebatên wê yên civakî

Dayika Hevrîn di berdewamiya axafitina xwe de diyar kir ku Hevrîn bi destpêkirina şoreşê re Yekîtiya Rewşenbîran avakir û wiha domand: "Hevrîn di dema destpêka şoreşa Rojava de, di sala 2011` an de Saziya Nûrî Dêrsimî û Yekîtiya Rewşenbîran avakir. Piştire di nav Rêveberiya Xweser a Bakurê Rojhilatê Sûriyê de cihekî payebilind girt. Di heman demê de ew bû rêvebera Yekîtiya Rewşenbîran, herwiha korsên perwerdê ji bo xwedekaran vekir, êdî kurd,xiristiyan û ereb bi zimanê wan perwerde dikirin. Hevrîn salekê di Desteya enerjiyê ya kantona Cizîrê de kar dikir û bû hevseroka wê. Piştî wê wekî hevseroka Desteya Aborî kar û xebat da meşandin. Di sala 2012 `an de jî bû yek ji damezirînerên Weqfa Zanist û Ramana Azad ya kantona Cezîrê."

### Kar û xebatên siyasî

Sûad Mûstefa di dewama axaftina xwe de wiha anî ziman: "Hevrîn di sala 2015'an de bû cîgira hevserokê kantona Cizîrê. Piştire di sala 2016'an de bû hevseroka kantona Cizîrê. Pişt wê Hevrîn di qada diplomasî de jî gelek kar û xebat da meşandin. Herwiha beşdarî danûstendinên Rêveberiya Xweser bi aliyên cîhanî yên wekî Emrîka , Feransa û welatên rojavayî bû. Ew bi karên xwe yên dîplomatîk dihat nasîn. Hevrîn ji bo zêdekirina xweşbînî û yekîtiyê di nava kurd, ereb û xiristiyanan dixebitî. Her wiha di sala 2018'an de wê Partiya Pêşrojê ava kir û bû yek ji dameznînera wê partiyî."

### Şehadeta keça ciwan Hevrîn Xelef

Dayîka Hevrîn Sûad Mistefa derbarê şehadeta Hevrîn de wiha axivî: "Hevrîn di 12'ê Cotmeha 2019`an de dema ku diçû ser karê xwe, li ser riya M4 ya di navbera Til Temir, Eyn Îsa de ji aliyê çeteyên girêdayî dagirkeriya Tirk ve bi awayekî hovane hat gulebarankirin û işkencekirin. Ji ber ku Hevrîn kar ji bo Sûriyayeke demokratîk û pirengî dikir, çeteyên dewleta tirk birengekî dijmirovî ew işkence kirin."




**'Divê sûcdar bên darezandin'**

Dayîka Hevrîn Xelef Sûad Mistefa axaftina xwe wiha qedand: "Piştî şehadeta Hevrîn Xelef gelek dengên piştgiriya bi doza wê re bilind bûn. Lê belê tenê piştgirî têrê nake, her wiha divê dengên kesayetên jin ên serbixwe û rêxistinên navneteweyî yên piştevanî dan doza Hevrîn Xelef bibin yek, bi hemû hêza xwe hewl bidin ku doza wê rakin dadgehên navneteweyî da ku sûcdaran darizînin. Erka niha berpirsiyariya dîrokî li ser milê me ye ku peyam û armancên Hevrîn Xelef pêk bînin. Em soz didin ku riya wê û tevahî jinên di oxira parastina doza welat û gel de canê xwe feda kirine , bişopînin. Ji bo avakirina Sûriyeke pirengî ya demokratîk û nenavendî bixin.

## Xwenasîn



### Nirx û dewlemendiyên civakê

**Rohat Bulut**

Herî zêde dewlemendiya bajaran xwe li ser civakê dide der. Heke li bajarekî di warê etnîkî de dewlemeniyek hebe tê wateya ser erd û binerda wî bajarî jî dewlemend e. Di vir de em dewlemendiya madî û manewî di nav hev de û bi hev re dinirxînin. Lewre madî û manewî yanî diyarkirina van nirxan bi xwe ji civakbûyîn û watedayîna civakê pêk tê. Dema civak nirxekî bide vê dewlemendiyê û watedar bike dê her tiştên din bi xwezaya xwe derê pêş.

Li vir dema mirov civakbûyînê binirxîn e pêwîst e, mirov berê xwe bide pêkhateya bajarvaniyê. Heke li bajarekî hêmanên civakbûyînê yên bi hev re jiyanê yên netewên ji hev cuda hebe û xurt be tê wateya ku ew bajar di warê madî û manewî de jî xurt e. Mebesta me ya ji xurtbûn û dewlemendiyê ew e ku civaka li bajaran bi taybetî jî ya ku ji gelek pêkhateyên neteweyên ji hev cuda pêk tên dikaribe bi çand, ziman, foklor û taybetmendiyên xwe bijîn. Her wiha bi nirxên xwe yê ser erd û bin erd ve girêdayî be û dikaribe biparêz e.

Bi taybetî jî risteke mezin dikeve ser milê rêveberiyên herêmî. Divê rêveberiyên herêmî dikaribe vê dewlemendiyê biparêze û pêş ve bixe. Ji endizyariya avahiyên bajêr bigire heta gastronomiya bajêr li mîrateya civakê ya bajarvaniyê xwedî derbikeve. Her wiha pêwîst e rêvebirên herêm ne tenê li welatê xwe vê yekê bi tevahiya cîhanê bide nasîn. Ev danasîna civakê ya madî û manewî di heman demê de dê bibe misogeriya pêşeroja civakê.

Heke çand, ziman, bawerî û pir rengîniya civakê bê parastin û ew çand û exlaqê bi hev re jiyanê di asta hişmendî de bê pêşxistin dê ji tevahiya mirovahiyê re bibe mînakek. Di heman demê de bi vê yekê re dê aştî demokrasiya di navbera gelan de jî bê avakirin. Ji xwe li tevahiya cîhanê û bi taybetî jî li Rojhilata navî tişta pêwîst jî ev e. Dema em bala xwe didin şer û pevçûnê ku rû didin, em dibînin ku sedema sereke ew e ku ev çand qels e. Lewma jî ji her cure êrîşan re vekirî ye. Ev dibe sedem ku nirxên civakê ji holê rabe.

Ji lewre jî pêwistî pê heye ku rêveberiyên herêmî nirxên civakê biparêz e. Lewre parastina civakê bi xwe di parastina nirxan de derbas dibe. Heke nirxên hevpar ên civak û mirovahiyê neyên parastin mirov nikare behsa civakbûyînê jî bike. Bi taybetî jî ev bi serê xwe û jixweber pêş nakeve. Ji bo wê jî girîng e ku hişmendiyek bê avakirin. Ew jî bi perwerde, watedayîn û rêzgirtinê ve girêdayî ye. Bêguman di vê hişmendiya ku bê avakirin de hewceye li gel mirov û civakê hemû zindîwar û bi giştî xweza li ber çavan bê girtin. Di bingeha xwe de watedayîna giştî ya xweza û hemû zindîwaran, li gorî wê tevgerîn dê mirov û civakbûyînê pêş ve bibe.

Lewma divê em hemû nirxan di nav hev de û bi nêrîneke bê berjewendî di bêjinga jiyana civakî re derbas bikin. Bi taybetî jî civakbûyîna li bajaran ji hemû êrîş û pişaftinê re vekiriye. Lewre jî rêveberiyên herêmî divê bi baldarî nêzî bajar, bajarvanî û bi hev re jiyana pirneteweyî bibin ku dikaribin nirx û dewlemendiyên madî û manewî yên civakê biparêz e.



# 8'emîn Pêşangeha pirtûkan a şehîd Herekol dest pê kir

Pêşangeha 8'emîn a Pirtûkan a Şehîd Herekol ji aliyê Desteya Çandê ya Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê ve bi dirûşma "Ka Em Xwendinê Bikin Şêweyekî Jiyanê" li hola Zana ya bajarê Qamişloyê dest pê kir.

**Ronaz Silêman/Qamişlo**

Desteya Çandê ya Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi koordîneya Desteya Çandê ya kantona Cizîrê salane Pêşangeha Pirtûkan a Şehîd Herekol li dar dixe. Gelek çapxaneyên xwecih û yên navneteweyî beşdar dibin. Îsal jî 8'emîn pêşangeha şehîd Herekol di 15'ê Cotmehê de bi dirûşma "Ka em xwendinê bikin şêweyekî jiyanê" li hola Zana ya bajarê Qamişloyê dest pê kir û di 22'ê Cotmehê de wê bidawî bibe. Pêşengeh ji 8 sibehê û heta 8'ê êvarî deriyê xwe li pêş mêvanan vedike.

Di van 8 rojan de 54 çapxane û saziyên wêjeyî bi 143 hezar pirtûk û bi 15 hezar sernavan beşdar bûne. Herwiha pêşangeh ji aliyê diyaka şehîd Herekol Xedîce Ibrahîm ve hat vekirin.

Berî destpêkirina pêşangehê kêliyeke rêzgirtin hat girtin. Piştre axaftina vekirina pêşangehê ji aliyê dayika şehîd Herekol Xedîce Ibrahîm hate kirin û wiha got: "Ez 8'emîn pêşangeha şehîd Herekol li hemû kesên beşdarvan û Rêber Apo pîroz dikim."

Herwiha beşeke stranbêjiyê ji aliyê dayika şehîd Herekol, dayika şehîd Hevrîn Xelef û Sînem Şiwêş ve ji bû beşdarvanan hate gotin. Piştre Hevserokê Desteya Çandê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê Mirhef Fehed axivî û wiha got: "Her sal di pêşangehê de hejamra weşanxane û pirtûkan zêde dibe. Ev pirtûk jî mîna pêkhateyên xwe yên li herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê renge rengin, ev yek jî hevgirtina gelan û Neteweya Demokratîk nîşan dide."

Di heman mabetê de komîteya amadekar a pêşangehê Firyal Çolî diyar kir ku ew 3 meh in amadekariya pêşangehê dikin û wiha got: "Îro em tevlî zor û zehmetiya vê pêşangehê bi hev re û bi saya xwîna şehîdan û di serî de şehîd Herekol vedikin. Herwiha wekî ku Cegerxwîn gotiye"Xwendin nebe kes naçe pêş" em jî dixwazin bi riya van çalakiyan bi taybet pêşangehên pirtûkan çanda xwendinê li pêş bixin û em hêvî dikin ku em bighên vê armancê."

Di heman demê de ji aliyê Meclis Malbatê Şehîdan a Kantona Cizîrê ve diyariyek ji bû pêşangehê hate kirin.

### Bernameyê pêşangehê

**Roja 2'an ji pêşangehê:**

-Semînerek bi sernavê: Wêje û rexnegeriya wêjeyî li Rojavayê Kurdistanê wê ji aliyê nivîskar Merwan Berekat ve bê lidarxistin.
-Ahenga imzekirina pirtûkan bê kirin.
-Şahiyeke hunerî bê lidarxisitin.

**Roja 3'an ji pêşangehê:**

-Semînereke bi sernavê: Pêla nû ya Romana Sûrî û Bandora Şer wê ji aliyê nivîskar Leyla El-Amirî bê lidarxistin.
-Ahenga imzekirina pirtûkan bê kirin.
- Şahiyeke hunerî bê lidarxisitin.

**Roja 4'an ji pêşangehê:**

-Semînereke bi sernavê: Dîroka wêjeya kurdî wê ji aliyê nivîskar Arşek Baravî ve bê lidarxistin.
-Ahenga imzekirina pirtûkan bê kirin.
- Şahiyeke hunerî bê lidarxisitin.

**Roja 5'an ji pêşangehê:**



-Panêla bi sernavê: Pêşangeha pirtûkan a şehîd Herekol, rewş, nerîn û asoyên pêşerojê bê lidarxistin.
-Ahenga imzekirina pirtûkan bê kirin.
- Şahiyeke hunerî bê lidarxisitin.

**Roja 6'an ji pêşangehê:**

-Ahenga imzekirina pirtûkan bê kirin.
- Şahiyeke hunerî bê lidarxisitin.

**Roja 7'an ji pêşangehê:**

-Ahenga imzekirina pirtûkan bê kirin.

**Roja 8'an û ya dawî ji pêşangehê:**

Ahenga bidawîkirina pêşangehê.
-Axaftina Desteya Çandê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê bê kirin.
-Axaftina komîteya amadekar a pêşangehê bê kirin.
-Xelatkirina weşanxane û saziyên ku beşadarî pêşangehê bûne.
-Xelatkirina nivîkaran.
Hêjayî bîranînê ye ku Pêşangeha Pirtûkan a Şehîd Herekol cara yekemîn 20'ê Tîrmeha 2017'an de ji bo bîranîna têkoşer û nivîskar Hisên Çawîş hat lidarxistin.

# Hilbijartinên têkbirina hişmendiya PDK'ê

**Argêş Gewda/Qamişlo**

**Namzetê Tevgera Helwest ya Dihokê Bedel Berwarî da xuyakirin ku hilbijartinên parlementoya Herêma Kurdistanê, ne tenê di navbera YNK'ê û PDK'ê de ne û ji bona hilbijartin bi şewazekî ewle û coş derbas bibe, me amadekariyên xwe xurt kirin.**

Di 6'ê Mijdara 2022'yan de dema yasayî ya Parlamentoya Herêma Kurdistanê bi dawî bibû û piştre temenê parlamento û hikûmetê salek hate dirêjkirin û hîn bi awayek ne zagonî hikumetê karê xwe berdewam dike. Parlamentoya Herêma Kurdistanê di10'ê Mijdara 2022'yan de dema parlamentoyê heya 31'ê Kanûna 2023'yan dirêj kir. Berdevkê Serokê desteya bilind ya hibijartinan yê demborî Dilşad Şehab di 26'ê Hezîrana 2024'an de ragihand ku serokê herêma Kurdistanê Nêçîrvan Barzanî biryar daye ku di 20'ê Cotmeha 2024'an de, hilbijartina



parlamentoya Herêma Kurdistanê were lidarxistin.

Derbarê hilbijartinên Parlementoya Herêma Kurdistanê de û amadekariyên tên meşandin de, yek ji namzetên Tevger Helwest ya rêza 1' emîn a Dihokê Bedel Berwarî ji rojnameya me ra axivî.

### 'Ev hilbijartine ne tenê di navbera du aliyan de ye'

Endamê Tevgera Helwest Bedel Berwarî da xuyakirin ku ew pir giringiyê didin hilbijartinên Parlementoya Herêma Kurdistanê û wiha dest bi axiftina xwe kir: "Pêş dîtina me, ya ji bona hilbijartinên Parlementoya Kurdistanê yekem care ku hilbijartinek wisa bêalî derbas dibin. Yekem care hilbijartin serbixwe bê ku ti alî bandor bikin tên rêve birin. Ev hilbijartine, ne tenê hilbijartinek ji rêzê ye, hilbijartinên hebûn û tinebûna Başûrê Kurdistanê ne. Em hewil didin ku hejmareke mezin ji gelê Herêmê deng bidin ji bona ev desthilatiya dijminê gelê Kurd re piştgrî dike, ji dîroka Kurdistanê bê rakirin."

### 'PDK'ê û dewleta Tirk ya dagirker naxwazin hilbijartin pêk were'

Berwarî axiftina wisa domand: "Di van hilbijartinan de ji bo Silêmanîyê 38, Hewlêrê 34, Dihokê 25 û Helepçe jî 3 kursî hatin diyar kirin. Li Hewlêr û Silêmaniyê jî 2 kursî ji bona Tirkmen û Xiristiyanan hatine dayîn. Ji ber ku li raya giştî pir giringî didin hilbijartinan û ti alî nikarin dengê gelê me asteng bike. PDK'ê ji bona desthilata wê têk neçe, li serî dekûdolaban dide.




Nezî 250 hezar dengdar navê wan di lîsteya dengdaran hatin derxistin. Dewleta Tirk ya dagirker jî gelek bajarên Başûrê Kurdistanê ji bona PDK'ê deng kom dike. Ev hevkariya PDK'ê û dewleta Tirk ya eşkere dixe berçavan."

### 'PDK'ê ji bona lîstokê xwe bidomîne PKK'ê dike hecet'

Bedel da xuyakirin ku bi ti awahî PKK'ê tevlî hilbijartinên Parlementoya Herêma Kurdistanê nebû ye û axiftina xwe wisa qedand: "Lîstokên PDK'ê û dewleta Tirk ya dagirker bi gotina PKK'ê tevlî hilbijartinên parlamentoyê dibe ne rastin. Ev hewildanên têkbirina ewlehiya Herêma Kurdistanê ye. Em rê nadin ev propagandayê ne rast. Hejmara kursiyên PDK'ê berê 38 bû, hilbijartinên dawî de hejmar man 14 kursî. Ev êdî têkçuyîna xwe bi derevan digirin. Lê ruxmê her cûre propangadayan jî em ê hewil bidin ku gelê me dengê xwe bikarbîne."

# Di nav zehmetiyên koçberiyê de, hêviya vegerê

Jina bi navê Wedha Hisên ku piştî dagirkirina Serêkaniyê di cotmeha 2019'an de neçarî koçberiyê bûye û 5 salin li kampa Telai dimîne, diyar kir ku ew ê herdem bi  hêviya vegera li ser axa xwe jiyan bikin.

**Ayşa Silêman/ Qamişlo**

Di 9'ê Cotmeha 2019'an de dewleta Tirk a dagirker û çeteyên girêdayî wê êrişî Serêkaniyê û Girê Sipî kirin û ew dagir kirin. Piştî dagirkirinê bi 100 hezaran welatî neçarî koçberiyê bûn û li kampên Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi cih bûn.

Ji ber koçberiyê bi hezaran malbat reweşke zeheme di kampan de jiyan dikin, yek ji wan malbatan jî, malbata Wedha Hisên e.

Jina bi navê Wetha Hisên temenê wê 60 saliye xelkê Serê Kaniyê ye û ev nêzî 5 salan e ew û malbata xwe li kempa Telai ya girêdayî bajarê Hesekê bicih bûne. Ji ber zewaca wê ji lawê apê wê 4 lawên wê ker û lal hatine dinê, niha jî lawekî wê ji aliyê Hikumeta Iraqê ve hatiye girtin û tu agahiya wan ji rewşa wî nîne. Herdem jî daxwazê Wedha û malbata wê vegera Serêkaniyê ye. Di derbarê salvegera dagirkirina Serêkaniyê û zehmetiyên koçberên



wê jina bi navê Wedha Hisên ji Rojnameya me re axivî.

**Êşa dûrbûna ji cih û war girane**

Wedha Hisên derbarê serpêhatiya gel di roja yekem ya êrişên dewleta Tirk a dagirker ku di 9'ê Cotmeha 2019'an bû, herwiha destpêkirina pêvajoya giran ya koîberiyê  wiha got: "Şeva yekê ji koçberbûna me em li çolê raketin, êdî biryar hat ku em derbasî dibistanan bibin, nêzî salekê em di dibistanan de man, ev nêzî 5 salane ku em di kempa Telai ya girêdayî bajarê Hesekê bi cih bûn. Bûyera herî bi êş ew bû ku em ji warê xwe derketin û li çolan man, zarokên me bircî û bê cil bûn, ew dîmen ji ber çavên me naçin. Di kempê



de her meh çarekî mûnet didin me, di dema derbasbûyî de her meh du caran dihate belavkirin, lê niha kêm bûye, tevî ku em 8 kesin jî ji bo me kême, lê em neçarin, debara xwe bi vê yekê bikin û vê rewşê derbas bikin. Astengiya herî mezin em têre derbas dibin hatina demsala zivistanê ye, ji ber ku hemû konên me hewcedarî nûkirinê ne û dema baran tê hemû baran derbasî hundir dibe, sala borî jî herdû konên me li ber lehiya avê çûn.  Em ê hertim li ber xwe bidin û tucarî serî li hemberî dagirkeriyê netewînin, heya dilopek xwîn di canê me de heye em ê têkoşîna xwe berdewam bikin û wê her tim hêviya me ya vegerê hebe."

# Mala Berzanî hêza xwe ji ku digire

**Volqan Elî**

Yên ku belgeyên dîrokî tevdane, rêya wan bi ser pirtûkên dîrokî ve bûne dizanin çi bi serê gelan de hatiye... bi taybetî gelê Kurd. Bi taybetî jî qirina nozde û nêviya yekem a dedsala bîstan... Ne tenê kesên bizanin bixwînin û binivîsin û pirtûkan tevbidin dizanin... li piraniya herêmên Rojava, herî kêm herêmên Bedlîs, Botan û hin cihên din ên Bakurê Kurdistanê her kesî ku guh li pîrik yan jî bav û bapîrên xwe bûye, gotinên mezinên xwe guhdar kiriye, çi bi ser serê Mala Eliyê Unis hatiye û di axirê temenê xwe yê bê bext de Cemîlê Çeto ji xwe re çi gotiye, dizane. Dibe ku nifşên nû nebihîstibin. Werhasilî, piştî şerê Mala Eliyê Unis giran dibe, dewleta Tirk dikeve zehmetiyê, Cemîlê Çeto xwe digihîne hawara dagirkeran. Di demeke kurt de ku artêşa dagirker xwîna Kurdan têr dirêjîne, şervanên Mala Eliyê Unis jî li şûna teslîmiyetê, erdên Kurdistanê hêmêz dikin. Lê dijmin ji Cemîlê Çeto re jî nahêle. Dide pey wî jî. Li ser vê yekê ji xwe re dibêje; "Cemîlê Çeto ji kerê keto". Niyeta me ne ew e, em di hemû berxwedanên serdemên navborî de çi qewimiye bînin zima. Jixwe di çend hevokên li jêrî de, wêjevanê/a cîhanê ku di ser xwe re ti kesî din nedîtî jî di vê de zehmetî wê bikişîne.

Lê ji bo me Kurdan, ji ber ku ev dîroka me ya biêş her dişibe hev, danasîna berxwedan encamê wan bi çend hevokan jî mimkun e.

Dibe ku serhildana Bedirxan Beg ne ya destpêkê be, lê di dîroka vê serdemê de ji yên herî girîng yek e. Lê ew jî bi xencerek wekî Yezdan Şêr têk diçe. Yezdan Şêr femandarekî esasî yê Bedirxan Beg e, ruxmî vê di navbara Beg û Yezdan Şêr de nakokiyên li ser desthilatdariyê de hene. Osmanî bi vê baş dizane. Êdî jê pêde Yezdan xencera destê Osmaniyan e. Piştî ku li pişta serhildana Bedirxan Beg diçike, pergala Beg têk diçe.

Di vê serdemê de berxwedana herî dawî ku xencera xiyanetê lê ketiye jî, berxwedana Dêrsimê ya 1937-38'an e. Seyîd Riza Pîrê welatê Dêrsimê ye, ne serokê giştî yê Dêrsimê ye. Yanî kesekî rihspî, oldar û giregirê herêmê ye; her kes jê re rêz û hurmetê digire. Serokê berxwedanê Elîşêrê hozan, dîplomat û siyasetmedar. Dîsa, Brahîmê birayê Seyîd Riza û Elîşan fermandarên li ser eniyên Berxwedana Dêrsimê ne. Elîşêr bi xwe jî li ser eniyekê ye. Kesê bi navê Rayber di vê berxwedanê de wekî Cemîlê Çeto yan jî Yezdan Şêr erk dilîze. Ew bi xwe mirovê Pîr Seyîd Riza ye. Lê baweriya ti kesî bi Rayber tine. Ruxmî vê giregirên Dêrsimê dixe dewreyê, da ku bikaribe xwe bifiroşe dewletê.  Di encamê de dikare li herêmê bi rehetî bigere. Elîşêr û Zarîfe Xanimê di xendekên wan de diqefilîne. Dema ku Rayber dibînin, Zarîfe ji Elîşêr re dibêje "çi karê vî zilamî li vir he?" jixwe her kes bi Rayber dizane ku ew çi karî dike. Ji bo ku jê nekevin gumanê, Rayber bi xwe re Zeynel digerîne, ew li gel wî ye. Kirîv di Elewiyan de, ji bira pêştir e yanî cihê baweriyê ye. Ji ber vê yekê, Elî Şêr ji Zarîfeyê re dibêje, "kirîvê me Zeynel li gel wî ye, ma ew ê çi bike?" Lê dîroka xiyaneta Kurdan wisa nabêje, nameşe. Rayber û Zeynel keysa xwe dibînin, serê Elîşêr û Zarîfe Xanim jêvedikin û dibin, difiroşin dewleta Tirk. Piştî wê Rayber bi destê komara Tirk a dagirker tê kuştin.

Çîroka du sed salên dawî hema bêje dişibe van her du mînakan. Ruxmî xiyanet, dagirkerî, talan û malwêranî jî Kurdan kariye li serê çiyan, li gund û navçeyên dûr û nêzîkî dagirkeran bijîn.  Asîmilasyonê jî zêde kar li Kurdan nekiriye. Ruxmî, karesatên li ser serê gelê Kurd, Kurd heta îro hatine.

Tenê astengek xwe li lingê Kurdan dialîne, derd û kula Kurdan a qedîm: Xiyanet û xencera ji piştê ve... Dinya-alem jî di vê pêvajoyê de ne rehet bûye. Herî kêm di du şerên cîhanê de qira hevdû aniye. Bi milyonan mirov ji bo feydeya dewletên emperyalîst ketine xaka sar. Heta şerê duyemîn ê cîhanê, wekî pîrozbahiyeke şer be, li Hîroşîma û Nagazakî bi xwîna sedan hezar mirovî hatiye bi dawîkirin. Şaristaniya emperyalîst bi Şerê Cîhanê yê Sêyemîn bêhna xwe vedaye; her ku bêhna xwe vedaye, bi dehan hezar Erebên Filîstînî di binê xirbeyên bînayetan de xeniqîne. Mala Barzanî jî derd û kula qedîm a Kurdan bi destê Tirkên Turanî ve berdaye, li pişta gerîla bûye xencer. Di seytereyên xwe de bi sedan, maskên ji bo çekên kîmyawî girtiye û daye Tirkan. Keç û xortên Kurdan singa xwe dane ber çekên kîmyawî, negotina "ax"! vê mala bê bext wekî bersiva ciwanên Kurd bide, di Bihara sala 2024'an de serkirdeyên neviyên Osmaniyan li Çiyayê Metîna ku ji bo pêşmergeyên qedîm pîroz e, pêşwazî kirine. Çawa ku ji bo her gelî wisa ye, ji bo Kurdan jî welat dayika herî mezin e. Çi heyf e ku wan, dagirkerî bi şanazî fermoyê Kurdistana qedîm kirine.

Eger Mala Barzanî, hemû çîroka Cemîlê Çeto zanibe, pê dizane ku hin giregirên herêmê ji Cemîlê Çeto re gotine, "vê xiyanetê neke Cemîl. Eger em ji Tirko re şîv bin, tu jî paşîv î; bizane!"



## Çareserî bi şerê taybet na bi hiqûqê pêkane!

**Dilyar Cizîrî**

Ji Adara sala 2021'yan tam, piştî telefûna bi Mihemed Ocalan a çend deqeyan û vir ve tu agahî ji Rêber Abdulah Ocalan nehatiye girtin. Sîstema tecrîdê ya girankirî bi dijwarî hate zêdekirin. Tevahî qanûnên li Tirkiyê û cîhanê ji aliyê dewleta Tirk ve hatin binpêkirin. Di demekê de ev rewş bi hemû dijwariya xwe dewam dike. Hin agahî hatin belavkirin ku têkilî di navbera Rêber Abdulah Ocalan re çêbûye.

Bêyî Tevgera Azadiyê tu agahiyan derbarê mijarê de belav bike, hin saziyên ragihandinê bi îdaya ku têkiliya Abdullah Ocalan bi riya bernameya Watsapp bi Rêveberiyên Tevgera Azadiyê li Qendîlê re çêbûye. Di heman demê de silavdayîna kesayeta nijatperest Dewlet Behçelî ya bi perlementerên DEM-Partiyê re wekî destpêka pêvajoyeke nû pênase dikin.!

Bi rastî dema min nûçeya wan xwend ez matmayî mam, ev ewqas gelê kurd ehmeq û nezan hesab dikin? Ewqas dixwazin mijarê biçûk nîşan bidin? Heger rast dewleta Tirk dixwaze pêvajoyeke aştiyê destpê bike, hemû rê û rêbaz diyar in. Gava yekem bela dawî li sîstema tecrîdê bîne û herî kêm di mijara Imralî de li gorî qanûnên xwe tevbigere. Wekî din pir rehet dikarin mijarên siyasî bi partiyê re nîqaş bikin û danûstandin werin destpêkirin.

Ema tişta diyar dibe, encama berxwedana gêrîla û têkçûyîna Artêşa Tirk derdikeve holê. Erdogan û fermandarên wî yên leşkerî wiha xeyal dikirin, di mijara balafirên bê mirov de gavên mezin avêtine, êdî dikarin li her derê derbeyên giran li gelê kurd û hêzên wan bixin. Bi rastî jî çend salan balafirên wan ên bê mirov kêm zêde be bandoreke xwe hebû. Ema ne di asta ew xeyal dikin. Di Newroza derbasbûyî de dema Fermandarê Biryargeha Navendî ya  NPG'ê Murad Keraylan mizgînî da. Wê demê sîstema "Tenê Artêşa Tirk li jorê" têk çû. Hêzên Gêrîla ew zemîn şikand û balafirên bê mirov ên dewleta Tirk ên herî pêşketî bi hêsanî anîn xwarê. Di heman demê de yekîneyên Gêrîla yên Azmanî jî ketin dewrê û gelek çalakiyên ji ezman ve li dijî artêşa Tirk pêk anîn. Ji ber wê jî mirov dikare bêje, ev qonaxa guhertina hevsengiyan e. Hikûmeta Erdgoan-Behçelî bi taybet piştî şerê Xeza û Lubnanê dizanin di rojhilata Navîn de guhertinên mezin hene. Ji ber wê jî dixwazin gelê kurd û raya giştî bixapînin. Heger rast dixwazin pêvajoya danûstendinan destpêbike, pir rehet dikarin danûstandinên siyasî bidin destpêkirin. Ema heger dewleta Tirk û rayedarên wê xeyal dikin ku ew ê bi rêbazên şerê taybet û bi îdaya ku wan tecrîd şikandine, wê nikaribin rêveberiya gelê kurd û civakê wê bi navendên şerê taybet bixapînin.

Di encama berxwedana gêrîla û derbeyên giran li dijî artêşa wan tengav bûne, ema wiha diyare bi niyetek qirêj serî li hemû rê û rêbazan digirin. Pêre hin kes wekî hemû nûçeyên wan rastin nirxandin dikin. Em jî ji wan kesan, dewleta Tirk û hemû cîhanê re jî dibêjin çareserî vegera hiqûqan e. Heta tecrîd heye û hiqûq hatiye binpêkirin, ne mumkine gelê kurd û tevgera azadiyê bikeve bin bandora wan.



# Komploya li dijî jiyana azad

**Remezan Olçen**

Gelê Kurd yek ji wan gelên kevnar ên Rojhilata Navîn e. Di demên cuda yên dîroka kevnar de bi çand û hunera xwe, bi siyaseta xwe bandorê li erdîngariyeke berfireh a dinyayê kiriye. Mirovahiya îro ji ilmên pozîtîf heta bi metafîzîkî, bawerî û bîrdoziya, ziman gelek tişt ji vê çanda qedîm wergirtine. Lê mixabin em îro di vê cîhanê di bin hukma pergala serdest de blindest in. Erê raste ji sedsala 16'an ve Kurd ji aliyê împaratoriyên mezin ve bi êş û azaraên mezin re rû bi rû mane. Lê di vê sedsala dawîn ango ji sedsala 20'î ve Kurd û Kurdistan çavkaniya jiyana niştecih û serbixwe tê xwestin ku bi temamî bê qirkirin. Em weke ferdên vê civaka kevnar her roj bandora vê siyasetê dibînin, hîs dikin.

Lê ev 50'î salên dawîn e bi derketina Rêber Apo şens û derfet ji Kurdan re peyde bûye. Heta ev 20-25 salên dawîn e ev şens û bext li rûyê mirovahiya pêşverû li rûyê jin û ciwanan, li rûyê bindestan tevahî dike. Rêber Apo di "çala mirinê" di Îmraliyê de fikr û felsefeya jiyaneke nû danî. Ew xwedan wê hêz û şiyanê bû ku hikûmranên cîhanê ew cewher dîtin, nas kirin û bêbextiyê lê kirin. Bi encama komployeke ku di dîrokê de mînakên xwe pir kêm e rabûn hemû lê bûn yek û ew radestî dewleta Tirk a dagirker, mêtinger û qirker kirin.

9'ê Cotmeha 1998'an Rêber Apo bi





komployeke navnetewî hat dîlgirtin. Lê komplogeran encax dikarîbû bi fizîkî ew dîl bigre. Nekarîn pêşî li fikr û ramana ronahiyê bigirin. Ji xwe ji ber wê hindê ye ku komplo di nava komployê de ev 26 sal in tê meşandin. Ji jiyana azad a Kurdan, a gelan ditirsin. Kurdên ku bi hezarê salan e li ser axa xwe ye bi saya têkoşîna Apoyî dike azad bibe. Îcar ev azadiyeke wisa ye ku bi azadiya xwe re kesî bindest nake hukmê li ser kesî nake. Bi azadiya xwe re pêşniyaza jiyana azad li hemê gelên li derdora xwe, li gelên cîhanê dike.

Di destpêka salên 2000'î de fikirdarên pergala muesses a cîhanê behsa dawiya dîrokê dikirin, digotin; êdî dîrok bi dawî bû, şoreş têk çûn, yek pergalek heye, yek jiyanek heye ew jî jiyana modernîteya kapîtalîst e. Xwestin jiyana mirovan tev tarî bikin. Heta bi hêviyê jî ji destê wan dixwestin bigrin. Lê Rêber Apo ji 9'ê Cotmeha 1998'an heta 15'ê Sibata 1999'an li Ewrûpa, Rûsya, heta bi Kenyayê xwest muxatebekê bibîne, xwest bibêje; berbayê çîrokên berdevên pergala modernîteyê nekevin. Werin em li hev werin, jiyaneke din mimkûn e. Dîrok bi dawî nebûye, dîrok niha ye. Em dikarin dîrokê bi hev re binivîsin. Lê wê demê kesî lê guhdarî nekir. Rêber Apo vê lêgerîna xwe li wê "çala mirinê" li Îmraliyê jî dewam kir. Bi parêznameyên xwe Tevgera Azadiyê ji nû ve bi rêxistin kir, gelê Kurd perwerde kir û paradîgmaya modernîteya demokratîk pêş xist. Îroroj li cîhanê hemû mirovahiya pêşverû xwedî li banga Rêber Apo derdikevin. Dibêjin; jiyaneke nû mimkûn e. Dewa azadiya fizîkî ya Rêber Apo dikin. Dizanin ku komploya li hemberî Rêber Apo komploya li dijî jiyana azad e. Dizanin ku ew komplo li hemberî wan e jî. Li hemû parzemîn û welatan, bi pêşengtiyan jin û ciwanan ku zimanê wan, çanda wan ji ya Kurdan cudatir e. Li dora ronahiya fikrên Rêber Apo li hev kom bûne weke perperokên li dora agir kombûyî dest dane destê hev, mil dane milê hev û agirê azadiyê geş dikin.

Di vir de tevî têkoşîna 26 salan a gelê Kurd û yek bi yek têkoşîna me ya ji bo azadiyê ji ber ku em hêj negihîştine meqseda xwe lazim e em kumê xwe daynin ber xwe û bifikirin. Me li ku derê kêmasî kirin. Şaşiya me, nebesiya me çi bû, me karî em çi bikin û me nekir ku ev pergala qirkirinê hê jî dixwaze qira me bîne, dixwaze vê banga ji bo jiyana azad bitefîne. Îro roj di salvegera vê bêbextiya mezin a di şexê Rêberê me de hatiye kirin pêwîste ku em tev, li hemberî vê bêbextiyê di nava têkoşînêdebin û pêwîste ku em biryara xwe bidin û helwesta xwe raber bikin. Hemû bend û astengiyên li pêşiya me pêwîste ku, em hemûyan biqetînin. Wê demê em ê bi Rêberê xwe Rêber Apo re li welatê xwe azad û serfiraz bin. Dem dema şikandina zincîrên koletî û bindestiyê ye. An jiyana azad an jiyana azad. Ji bilî vê her tişt çîrok e.

## Dijminahiya Kurdan rê li ber çi vekiriye



**Zekî Bedran**

Erdogan li gorî kêfa xwe diaxive. Jixwe ti rojnamevanek ku jê pirsan bike û nakokiyên wî derbixe holê tune ye. Ragihandin ji bo xwe xistiye mîna bexçeyê gulên bê sitirî. Binêrin bê ka ji rojnamevanan re gotiye: "Derbarê Îran, Rûsya, Îran û Sûriyê wekî mekanîzmeyek sêalî bi hev re dixebitin û li aliyê din jî hêzên koalîsyonê yên Amerîka, Birîtanya û Almanyayê ne. Hêzên koalîsyonê piştgiriyê didin rêxistina terorê YPG'ê ku girêdayî rêxistina terorê ya PKK'ê ye û pêwîste Rûsya, Îran û Sûriye li dijî vê rewşa ku gefa herî mezin e li ser yekparçebûna axa Sûriyeyê ye, hê bi bandortir bikevin nava tevgerê." "Sûriyeyê gelek êş kişand û ji destpêka şerê navxweyî û vir ve me got ku em hurmetê nîşanî yekparebûna axa Sûriyeyê didin. Me hemû rêyên dîplomasî ji bo parastina serweriya Sûriyê bi kar anîn."

Li Tirkiyeyê axaftinên xweser hene. Bi kar anîna yek ji wan gotinan wê berovajî van pênaseyan neke: "Were, ji vir bişewitîne, xuyaye Erdogan difikire ku bîra mirovan tune ye!" An jî wek Hîtler her tiştê ku dibêje kerametan lê bar dike. Dinya li dora wan dizivire, an jî wisa difikirin. Erdogan jibîr dike ku  ew bi xwe jî di nav koalîsyona ku dabeşkirina Sûryeyê esas digre û dêbêje 'ez Kurda destek dikim' de ye.  Tişta em dizanin Tirkiye jî tevlî koalîsyona li dijî DAIŞ'ê bibû. Niha jî tevlîbûna civînan berdewam dike. Lê ji ber ku koalîsyon li gorî helwêsta wî tevnagere, wî bi piştgirîkirina terorê tawanbar dike. Tiştê ku ew jê re dibêje teror, di cîhanê de ji derveyî wan ku wek teror nayê dîtin YPG ye.

Erdogan bi ser xistibû ku berê DAIŞ'ê bide Kobanê. Û wî pir bi wan bawer kiribû. Ji bo ku mizgîniyê bide gelê xwe got, "Kobanê ket, ha dikeve". Lê nekarî DAIŞ'ê rizgar bike! Yê ku ket û serûbin bû, DAIŞ bû. Niha jî mîna DAIŞ'ê, Rûsya jî dixwaze berê Îran û Sûryeyê jî bide Kurdan.

Bi rastî jî Erdogan îtîrafeke cidî dike. Bi rastî jî tevlî koalîsyona li dijî DAIŞ'ê nebû. Gotina wan a tevlîbûna kualîsyonê, ji bo dagirkirina Sûryeyê menewrayek bû. Derdê wî yê sereke pêşî lê girtina Kurdan û astengkirina statûya wan bû. Bi giranî gihiştiye vê armancê. Hêzên xwe yên leşkerî anîn Sûryeyê û cihên weke Bab û Cerablûsê dagir kirin. Bi vê yekê pêşî li bi hev ve bûna Kobanê û Efrînê girt. Li ser armanca xwe mukur hatin û gotin, "Me weke xencerekê mudaxele kir da ku herêmên Kurdan nebin yek."

Erdogan mijûl bû, tawîz da, bi Rûsyayê re li hev kir ku êrîşî Efrînê kir û dagir kir. Her wiha bi Trump re li hev kir û Girê Spî û Serêkaniyê dagir kir. Demagojiyê didomîne û dibêje ku Amerîka piştgiriya rêxistina terorê YPG dike. Ger DYA piştgirîya YPG'ê bikira, wê qada hewayî ji wan re venekira û deriyê dagirkeriyê venekira. Berovajî vê, DYA'yê piştgirî da Erdogan ku her du bajaran dagir bike. Ev bûyer beriya sedsalan çênebûne. Di hiş de pir tiştên nû ne.

Erdogan mirovekî pir bê rû ye. Di esas de karekterê hemû faşîstan bi vî rengî ye. Dibêje Sûryeyê gelekî êş kişandiye û Tirkiyê her dem yekparebûna axa Sûryeyê parastiye. Çi nabêjin! Erdogan yek ji hêzên pêşeng e ku bi Îxwanciyan, DAIŞ û El Nûsra re tifaq kir û Sûriye kişand nava vê tofana bi xwîn. Çi zû ji bîr kir! Dê biçûya û nimêja fethê li mizgefta Emewiyan a Şamê bikira! Erdogan di rêza herî pêş de bû yên ku ev êş û wêraniya mezin anîn serê gelê Sûryeyê. Niha jî wek kevçiyek sipî ji şîr derdikeve, maşallah!

Her tim parastina serweriya Sûriyê dikir! Çi nabêjin? Ji ber ku wî serweriya Sûryeyê parast, "Artêşa Azad" û piştre "Artêşa Millî ya Suryeyê" ava kir. Weke ku bi deh hezaran endamên Îxwan, bermahiyên DAIŞ û El Nûsrayê û yên ku benê wan hatine qetandin bi çek kir û perwerde kir ne Erdogan e diaxive. Kê jî di nav axa Sûriyê de li dijî artêşa fermî ya dewleta Sûryeyê, "Artêşa Millî ya Sûriyê" ava kir? Ne tenê artêş, Hikûmeta Demkî ya Sûryeyê jî hat avakirin. Ez meraq dikim ji xeynî Erdogan yekî din van ava kiriye? Mane wisa ye, lazime were pirsîn.  Ji ber ku Erdogan wek mirovekî bêguneh diaxive!

Çawa ku duh Sûrye kişand nav bahozeke bi xwîn û axa wê dagir kir, îro jî Erdogan dixwaze heman tiştî bike. Tenê hedefa wî hinekî piçûktir bûye. Wê demê xwest serweriya Sûriyeyê ji holê rake, Îxwaniyan bîne ser desthilatdariyê û serweriya xwe li ser wan ava bike. Hêza wê têrî vê ya nekir. Ev bi ser nexist. Tiştê ku tene di destê wî de maye dijminatiya wî ya ku îfleh nabe ya li hemberî Kurdan e. Bi tena serê xwe êrîşkirin û tunekirina Kurdan ne ewqas hêsan e. Her wiha ji herêmê xwîn diherike. Konjoktur bi lez diguhere. Rûsya vê carê dixwaze bi Îran û Sûryeyê re lihevkirinekê çêbike û Kurdan ji holê rake. Eşkere ye ku ew pir ditirsin ku li herêmê modêleke azadîxwaz ya wek Rêveberiya Xweser û demokrasiyê derkeve holê.



## Lîstika Erdogan a Nû

**Farûk Sakik**

Di siyaseta Tirkiyê de kevneşopiyeke dîrokî heye. Dema serokkomar an jî serokwezîr diçin derveyî welat, komek rojnamevan digirin gel xwe û di balafirê de daxuyaniyan didin. Rojnamevanên wê tevlî vê rêwitiyê bibin Serokkomar biryar dide. Tu caran rojnamevanên mixalif tevlî vê rêwitiyê nabin. Di sefera Erdogan a Arnavût û Sirbistan de jî, me ji vê kevneşopiyê re şahidî kir. Erdogan di balafirê de daxuyaniyek balkêş da. Ji berê de pirsên ku şêwirmendên wî amadekiribûn û li rojnamevanan belavkiribûn, yek bi yek ji Erdogan hatin pirsîn.

Piştî geşadanên li Tirkiyê diqewimin, pirsek ji siyaseta cîhanê hat pirskirin. Dema dor hat Sûrî, Erdogan digot; ez bang li Rûsya, Îran û Sûriyê dikim. Li dijî planên Amerîka yên parçekirina Sûrî derkevin. Divê demildest werin cemhev. Mekanîzmayek sêalî divê were avakirin. Li hember planên Amerîka yên ji bo terorîstan helwestek were nîşandan û were astengkirin. Divê yekîtiya axa Sûrî were parastin.(Herêmên ku dagirkirî jibîr dike). Ev peyama wî di medya Tirkiyê de nehat servîs kirin. Rueters û Media Îsraîl girt rojeva xwe. Piştî demek di Medya Ereban de jî cîhek fireh girt. Em baş dizanin ku Erdogan van gotina parçekirina Sûrî zêdetir dixwaze bibêje, li hemberî statuya rêveberiya xweser ya Bakûr û Rojhilatê Sûrî helwest nîşanbidin.

Yên ku kaosa û qeyrana Sûrî kûr kir Erdogan bû. Bi çeteyan re lihev kir, ji wan re pêşengtî kir û êrişî rejima Şamê kir. Di  belgeyan de, di îfadeyên DAIŞ'yan de, dihat gotin; Me berê xwe dabû Şamê, me dixwest piştî Mûsil û Reqayê Şamê bigirin bin kontrola xwe, lê Erdogan got ji Kobanê destpêbikin. Erdogan li desthilatê bû lê bextewar nebû. DAIŞ têk çûbû. Li Rojava 3 kanton hatibû avakirin. Statuya rêveberiya xweser di qada navnetewî de dihat nasandin û têkilîyên wan yên dîplomatîk pêşdiketin.

Har û çavsorî bûbû. Ji Rêber Apo jî xwest ku 3 kanton werin fehskirin. YPG tevlî hêzên muxalif bibe û li dijî Şamê şer bikin. Rêber Apo ev red kirin û pêvajo bidawî bû. Tecrîd dest pê kir. Erdogan dît ew û çeteyên xwe di vî şerî de têk çûne û statuya Kurdan roj bi roj misoger dibe. Lavakirina bi Beşar Esad jî encam negirt. Ji bo vê yekê di wê balefirê de xwe avêt bextê Moskov, Tahran û Şamê, da ku Kurd li wê derê nebin xwedî statuyek.

Baş e..Ev Erdoganê evqas bi dijminatiya Kurdan har bûye wê çawa pêvajoyeke nû bide destpêkirin. Bahçeliyê ku dijminatiya xwe ya Kurdan li notêr dayî tesdîqkirin, wê çawa pêvajoyeke nû bide destpêkirin? Di sala 2015'an Rêber Apo ji wan re gotibû ku Rojava xeta me ya sor e. Evcar ku herin Îmrali wê ji Rêber Apo çi bixwazin? Daxuyaniya herî dawî ya Rrêxistina Çavderiya Mafên Mirovan a Sûrî de dihat gotin. Di vê hefta dawî de 190 TIR lojîstikên eskerî derbasî Îdlibê û heremên dewleta Tirk dagirkiriye hatiye kirin. Li aliyek bang dike qaşo yekparetiya axa Sûrî dike û li aliyek jî dagirkeriya xwe xûrt dike. Medyayê ev sextekarî dît ku cîh neda vê banga Erdogan. Ji aliyê hin çavdêrên siyasî ve tê gotin ku Îsraîl piştî Lubnanê wê berê xwe bide Sûriyê. Erdogan jî li gor vê îhtîmalê amadekariyek dike.  Dive Kurd vê lîstikê vê siyaseta qirêj bibînin û li gor vê yekê jî amadekariyên xwe bikin. Dive hemû nakokî û nîqaşên xwe deynin aliyekê, yekîtiya xwe ya netewî avabikin. Herî dawî, em gotina Rêber Apo ya berî Bihara Gelen destpêbike, bi bîr bixin: "Li Rojhilata Navîn guhertinên nû wê pêk werin.  Divê Kurd bi amade bin. Yekîtiya xwe ya eskerî û dîplomasiya xwe ava bikin"